# Bultena heftane

# 4/11/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

Nûçeyên ji cîhanê

## Ciwanên cîhanê di atolyeyê de hatin ba hev

Di roja 2. a Konferansa Ciwanên Cîhanê de ciwanan atolyeya 'Bi Jin Jiyan Azadî Ber bi Şoreşa Jinê ve' hatin cem hev.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ciwanen-cihane-atolyeya-bi-jin-jiyan-azadi-ber-bi-Soresa-jine-ve-hatin-cem-hev-41849

Çavkanî:JINHA



## Jinên ku dixwazin kurtajê bikin tên astengkirin

Jinên ku li bajarê Ciwanroyê dijîn diyar kirin ku zarokên wan di dema testên destpêkê yên ducaniyê de bi nexweşiyan ketine û dema xwestine kurtajê bikin, bi hincetên curbecur ji aliyê bijîşkan ve pêşî li wan tê girtin.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/jinen-ku-dixwazin-kurtaje-bikin-ten-astengkirin-41924

Çavkanî:JINHA



# Fransa biryara dersînorkirina çalakvana Filistînî da

Li ser biryara Dadgeha Îdarî ya Parîsê ya rawestandina biryara dersînorkirinê ya Wezareta Karên Navxweyî, Şûraya Dewletê biryara dersînorkirina aktîvîsta Filistînî Meryem Ebû Daqqa ji welêt erê kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/fransa-biryara-dersinorkirina-calakvana-filistini-da-41945

Çavkanî:JINAH



## Rojhilata navîn

# ‘Ez her xebata ji bo Helebceyê bi kêfxweşî dikim’

9’emîn festîvala Hinar û Payîzê ya Helebceyê îsal jî hat lidarxistin. Rengîn Selam 5 sal in bi deng û nivîsên xwe coşê dide festîvalê û wêneyan dikişîne dibêje ku ji bo xizmeta Helebceyê karê mezin û biçûk tune ye her xebat girîng û hêja ye.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/ez-her-xebata-ji-bo-helebceye-bi-kefxwesi-dikim-41829

Çavkanî:JINHA




# Hevseroka KCD'ê Leyla Guven: Silav ji gelê Filistînê yê berxwedêr re

Krîz û kaosa li Rojhilata Navîn naqede. Rêberê Gelê Kurd Ocalan bi salan berê gotibû, "Rojhilata Navîn a konfederal a demokratîk ji bo vê erdnîgariyê modela herî berfireh û civakî ye.”Ger ev sîstem bihata bicihanîn, îro gelê Filistînê ewqas bi tenê nedim.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hevseroka-kcd-e-leyla-guven-silav-ji-gele-filistine-ye-berxweder-re-41830

Çavkanî:JINHA



## Li bajarê Serdeştê xwendekar di mercên nebaş de dixwînin

Jinên bajarê Serdeştê yê rojhilatê Kurdistanê teqez kirin ku dibistanên wî bajarî bi kêşeyên mezin re rûbirû ne ji ber nebûna derfetên guncav ên xwendinê yên wek laboratuar û navendên werzîşê bandoreke neyînî li ser asta xwendina wan dikin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-bajare-serdeste-xwendekar-di-mercen-nebas-de-dixwinin-41833



## 'Divê jinên girtî tavilê bên berdan'

Odeya Şêwirmendên Maliyeyê ya Amedê bi rêya îfadeyên şahidên veşartî banga tevlîbûna doza li dijî endamên xwe kir û xwest jinên di çarçoveya dozê de hatine girtin bên berdan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-jinen-girti-tavile-ben-berdan-41834

Çavkanî:JINHA



# Jinên bajarê Helebceyê bi berhemên xwe beşdarî festîvalê bûn

Jinên xwedî kar di 9’emîn festîvala Hinar û Payîzê de berhemên xwe pêşandan Sê roj in 9’emîn festîvala Hinar û Payîzê ya Helebceyê berdewam dike û jinên xwedî kar pêşengiyê ji beşdariya festîvalê re dikin û berhemên xwe nîşan didin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-bajare-helebceye-bi-berhemen-xwe-besdari-festivale-bun-41835

Çavkanî:JINHA



# Li Xezayê rewşa jinên ducanî xerabtir dibe

Ji ber êrîşên Îsraîlê yên li ser Zîvala Xezayê berdewam dikin, jiyana bi hezaran jinên ducanî di xeterê de ye. Pispora zarokanînê Haya Hîjazî bang li saziyên mafên mirovan ên navneteweyî kir ku ji bo rewşê banga mudaxaleya lezgîn bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-xezaye-rewsa-jinen-ducani-xerabtir-dibe-41836

Çavkanî:JINHA



## ‘Li Başûr her diçe tundî zêde dibe’

Çalakvana mafên mirovan Diyarî Ferûdun diyar kir ku tevî li Başûrê Kurdistanê rêjeyek zêde ya rêxistinên jinan hene jî kuştin û tundiya li hemberî jinan di asteke zêde de ye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-basur-her-dice-tundi-zede-dibe-41841

Çavkanî:JINHA



## 26’emîn Komcivîna Stargehên Jinan destpêkir

26’emîn Komcivîna Navendên Şêwirmendî û Stargehên Jinan bi dirûşmeya ‘cîhanek bê stargeh’ bi pêşengiya Komeleya Piştevaniya Jinan a Îzmîrê ve li Îzmîrê pêk hat.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/26-emin-komcivina-stargehen-jinan-pek-hat-41848

Çavkanî:JINHA



# Bi ‘Projeya Diyalogan’ tevlîbûna jinan a siyasetê tê armanckirin

Perwerdeya ku di çarçoveya "Projeya Diyalogan" de li Bîngaziya Lîbyayê tê organîzekirin, bi armanca jinan teşwîq bike ku beşdarî siyasetê û diyaloga herêmî û navneteweyî bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-projeya-diyalogan-tevlibuna-jinan-a-siyasete-te-armanckirin-41858

Çavkanî.JINHA




# Jinên Xeza ên ku ji cihên xwe bûne di şertên zehmet de li berxwe didin

Ji ber êrîşên Îsrailê jinên ku bi ceribandinên xwe ji mirinê reviyane, li cihên ku xwe sipartinê di şert û mercên derveyî mirovî ji bo di jiyanê de bimînin hewl didin çareseriyekê ava bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-xeza-en-ku-ji-cihen-xwe-bune-di-serten-zehmet-de-li-berxwe-didin-41860

Çavkanî:JINHA



## [Li Îranê jehrîkirina xwendekarên keç berdewam dike](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Irane-jehrikirina-xwendekaren-kec-berdevam-dike-41862)

Êrîşên dewleta Îranê ya li ser xwendekarên jin didome, li Ahwazê bi dehan xwendekarên keç ji ber madeyên kîmyewî rakirin nexweşxaneyê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Irane-jehrikirina-xwendekaren-kec-berdevam-dike-41862

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Mexribê: Em ê piştevaniya bi gelê Filistînê re bidomînin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-mexribe-em-e-pistevaniya-bi-gele-filistine-re-bidominin-41863)

Jinên Mexribê diyar kirin ku li dijî êrîşên Îsraîlê yên li ser Xezayê wê bi gelê Filistînê re di nava piştevaniyê de bin û gotin: “Gelê Xezayê li ber çavên cîhanê tê qetilkirin. Divê demildest dawî li vê rewşê were anîn.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-mexribe-em-e-pistevaniya-bi-gele-filistine-re-bidominin-41863

Çavkanî:JINHA



## ‘Têkoşîna jina rêxistinbûyî em ê li her derê belav bikin’

AGIRÎ - Aktivîsta TJA’yê Solmaz Ozlen destnîşan kir ku li Panosê ji ber pergala feodal û eşîretê her wiha polîtîkayên dewletê, qirkirin û tundiya li dijî jinê gelek zêde bûye û ji ber vê zihniyetê ser bûyeran tê girtin. Solmaz, anî ziman ku ew ê têkoşîna jina rêxistintinbûyî li her derê belav bikin û li cem jinan bin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220817

Çavkanî:JINNEWS



## Li gorî rapora KCDP’ê di meha cotmehê de 19 jin hatine qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - KCDP’ê da zanîn ku di cotmehê de 19 jin hatine qetilkirin û 18 jinan jî bi awayekî guman jiyana xwe ji dest dane.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220853

Çavkanî.JINNEWS



# [Ji ber bê serpoş bû, rê nedan Nêrgiz Mihemedî bibin nexweşxaneyê](https://rojnews.news/ku/?p=286241)

Malbata çalakvana mafên mirovan Nêrgiz Mihemedî ragihand ku ji ber ku Nêrgiz serpoş li serê xwe nekir, nebirin nexweşxaneyê.

https://rojnews.news/ku/?p=286241

Çavkanî:ROJNEWS




# ‘Bi sedan dayik ji projeya mala cîhana zarokan sûdê digrin’

Projeya mala cîhana zarokan yek ji destkeftiyên jinan e û bi derfetên Rêveberiya Xweser e hatiye avakirin. Bi wê projeyê ji bo pêşketina jinan û rêgirtina li ber pirsgirêkên wan, xebat tên kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-sedan-dayik-ji-projeya-mala-cihana-zarokan-sude-digrin-41871

Çavkanî:JINHA



## 'Divê em ji bo jinên Îranê bikevin nava tevgerê'

Parêzvanên mafên jinan ên Misrê yên bertek nîşanî li Îranê qetilkirina Armîta Ground a 16 salî ya ji aliyê 'polîsên exlaq' ve dan, xwestin li dijî otorîteya zordest a Komara Îslamî ya Îranê ji bo jinên Îranê bikevin nava tevgerê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-em-ji-bo-jinen-Irane-bikevin-nava-tevgere-41873

Çavkanî:JINHA



## 'Ciwanên ku bi salan dixwînin nikarin bibin xwedî kar'

Rahnera perwerdê Tirîfe Celal a li ser xwendina ciwanan û bêkariya ku ew jiyan dikir axivî, diyarkir ku ciwan piştî xwendina bi salan nikarin bibin xwedî kar û da zanîn ev çavkaniya xwe ji bê planiya desthilatdariyê digre.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ciwanen-ku-bi-salan-dixwinin-nikarin-bibin-xwedi-kar-41875

Çavkanî:JINHA




# Jinên Rojhilat: Werîşe Mûradî li ku ye?

Parêzvanên mafên jinan ên Rojhilat banga piştgiriya kampanyaya ku ji bo endama KJAR’ê Werîşe Mûradî a ku ji aliyê îstîxbarata Îranê hate girtin û agahî jê nayê girtin dabûn destpêkirin kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-rojhilat-werise-muradi-li-ku-ye-41877

Çavkanî:JINHA




# Li Mexribê ji ber erdhejê jin bê kar mane

Jinên li parêzgeha Al Huz ya Mexribê ji ber erdheja ku bûye sedemê hilweşînek mezin, piştî felaketa mezin karê xwe winda kirin. Jin di konan de dibin şert û mercên zehmet têkoşîna jiyanê didin

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-mexribe-ji-ber-erdheje-jin-be-kar-mane-41878

Çavkanî.JINHA



## Jinên ciwan bi berhemên xwe reng dan festîvalê

Jinên ciwan ên ku beşdarî 9'emîn festîvala hinar û peyiz a Helebce bûne diyarkirin ku divê hê zêdetir giringî bê dayîn berhemên xwemalî û bi vê yekê wê derfetê kar ji bo ciwanan zêde bibe.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-ciwan-bi-berhemen-xwe-reng-dan-festivale-41879

Çavkanî.JINHA



## 'Qeyûm li cihê xizmeta gel ji bo şerê taybet dixebitin!'

Jinên hilbijartî diyar kirin ku qeyûm li herêmê li cihê xizmeta gel, ji bo polîtîkayên şerê taybet dixebitin û kaseyên pere ji bo cematan bedikin û gotin: "Em ê di vê pêvajoyê de xebatên xwe bidomînin û xwedî li vîna xwe derkevin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/qeyum-li-cihe-xizmeta-gel-ji-bo-sere-taybet-dixebitin-41890

Çavkanî:JINHA



## Intisar Al-Mujabirî: Divê Derne ji nû ve bê avakirin

Rêvebera Beşa Lezgîn a Wezareta derdorê Intisar Al-Mujabirî diyar kir ku divê bajarê Derna yê Lîbyayê ku lehiyê lê dabû, li gorî qanûnên hawirdorê yên navneteweyî bi lêkolîneke zanistî ji nû ve bê avakirin.

https://jinhaagency.com/ku/ekoloji/intisar-al-mujabiri-dive-derne-ji-nu-ve-be-avakirin-41891

Çavkanî:JINHA



## Di meha Cotmehê de 28 jin hatin qetilkirin

Li gor çeteleya tundîtûjiyê a JINNEWS'ê di meha Cotmehê de 28 jin ji aliyê mêr ve hatin qetilkirin. Mirina 13 jin û 3 zarokan bi awayek gûman kete qeydan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/di-meha-cotmehe-de-28-jin-hatin-qetilkirin-41893

Çavkanî:JINHA



## Qehweya Yemenê bi destê jinan car din bi navûdeng dibe

Çandiniya qehweyê ku ji bo Yemenê çavkaniyek aborî ye, ji ber bandora şert û mercên avhewayê di van demên dawî de gelek kêm bûye. Jin ji bo ji nû ve zindîkirina qehweya navdar a Yemenê Mochayê dixebitin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/qehweya-yemene-bi-deste-jinan-car-din-bi-navudeng-dibe-41894

Çavkanî:JINHA




## Jin di festîvala li Bostan Bahmanê de berhemên xwe pêşan dan

Karsazên jin ên beşdarî Festîvala Folklorî ya Îranê bûn, diyar kirin ku ew dixwazin di warê aborî de jîyanek serbixwe bijîn û jêhatîbûna xwe di jiyana karsaziyê de jî nîşan bidin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/jin-di-festivala-li-bostan-bahmane-de-berhemen-xwe-pesan-dan-41899

Çavkanî:JINHA



## 'Li Îranê bi paşguhkirina qanûnan hewl didin li ser gel otorîteyê pêk bînin’

Parêzer Marzieh Mohebî, bal kişand ku hikûmeta Îranê ji bo li ser gel otorîteya xwe pêk bîne, kê dixwaze ceza dike û qanûnan binpê dike û wiha got: "Ji bilî dadgehan tu mercî nikare biryara cezakirinê bide."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Irane-bi-pasguhkirina-qanunan-hewl-didin-li-ser-gel-otoriteye-pek-binin-41902

Çavkanî:JINHA



## Derbarê rojnameger Derya Ren û 3 jinên girtî de doz hat vekirin

Derbarê nûçegihana ajansa JINNEWS’ê Derya Ren û 3 girtiyên din de bi îdiaya “heqaret” û “bi qestî birîndarkirinê” doz hate vekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/derbare-rojnameger-derya-ren-u-3-jinen-girti-de-doz-hat-vekirin-41906

Çavkanî:JINHA



## Doza TJA’yê: Em ji ber nasnameya xwe jin û Kurdbûnê tên darizandin

Yekemîn danişîna doza TJA'yê dest pê kir. Girtî Bedîa Akkaya, wiha got: "Yekane sedema darizandina me, nasnameya me ya jin û Kurdbûn e."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/doza-tja-ye-em-ji-ber-nasnameya-xwe-jin-u-kurdbune-ten-darizandin-41907

Çavkanî:JINHA





## Li Elbakê mirina jinekê ya gûmanbar

WAN - Hamîde Oktay li gundê Bazê yê navçeya Elbakê bi awayekî gumanbar jiyana xwe ji dest da.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220904

Çavkanî:JINNEWS



## Parazvanên mafê jin ên Tûnisî: Riya me dirêj e

Jinên Tûnisê diyar kirin ku di encama têkoşîna bi dehan salan de di warê hiqûqî de hinek destkeftiyan bi dest xistine lê qanûnên heyî nayên bicihanîn û bi gotin ku riya wan dirêj, berbijêr û berbijor e û ji bo vê yekê banga berdewamiya têkoşînê kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/parazvanen-mafe-jin-en-tunisi-riya-me-direj-berjer-u-berjor-e-41916

Çavkanî:JINHA




## 10 sal cezayê girtîgehê li çalakvana Cezayirî hat birîn

Daraza Cezayîrê, biryar da ku aktîvîsta siyasî Amira Bourawî ku yek ji kesayetiyên herî pêş a muxalefeta Cezayîrê ye, mehkûmê 10 sal cezayê girtîgehê bê kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/10-sal-cezaye-girtigehe-li-calakvana-cezayiri-hat-birin-41919

Çavkanî:JINHA



## MKG’ê banga tevlîbûna danişîna rojnamevanan kir

MKG'ê, banga tevlîbûna danişîna duyemîn a doza der barê 18 rojnamevanan de hat kirin ku dê sibê li Amedê bê dîtin, kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mkg-e-banga-tevlibuna-danisina-rojnamevanan-kir-41920

Çavkanî:JINHA




## Weqfa Jin a Mexmûrê ji bo jinan derfetên kar diafirîne

Weqfa Jin a Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî Mexmûrê ku jinan di hemû aliyên jiyanê de bi rêxistin dike, bi projeyên cuda derfetên kar dide jinên wargehê.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/weqfa-jin-a-mexmure-ji-bo-jinan-derfeten-kar-diafirine-41937

Çavkanî:JINHA



## [‘Li Başûrê Kurdistanê daneyên tundîtûjiyê her sal zêde dibe’](https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-basure-kurdistane-daneyen-tunditujiye-her-sal-zede-dibe-41939)

Fermanbera dadgeha pêşîlêgirtina tundîtûjiya malbatê a bajarê Silêmanî Pexşan Mihemed diyarkir ku rewşa jinan ji ber zêdebûna tundîtûjiyê berbi xirabûnê ve diçe û got: “Daneyên tundîtûjiyê her sal zêde dibe.”

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-basure-kurdistane-daneyen-tunditujiye-her-sal-zede-dibe-41939

Çavkanî:JINHA



## [Jinên li Mexrîbê bi lîstoka ‘stargeh’ li dijî tundiyê hişyariyê ava dikin](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/jinen-li-mexribe-bi-listoka-stargeh-li-diji-tundiye-hisyariye-ava-dikin-41946)

Hunermenda Mexrîbê Zainab Al-Qadirî diyarkir ku lîstoka bi navê ‘Stargeh’ ji çîrokên rast ketiya rê û bal kişan ser rastiya jinên ku rastî tundîtûjiyê hatine û got: “Bi rêya hunerê hewl didim di nava civakê de guherînekê bidim avakirin.”

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/jinen-li-mexribe-bi-listoka-stargeh-li-diji-tundiye-hisyariye-ava-dikin-41946

Çavkanî:JINHA



# [Talîbanê qoltuxên pêşîn ên wesayîdan ji bo jinan qedexe kir!](https://jinhaagency.com/ku/rojane/talibane-qoltuxen-pesin-en-wesayidan-ji-bo-jinan-qedexe-kir-41947)

Talîbana ku dest daniye ser rêveberiya Efganistanê, bi taybetî mudaxeleyê warê jiyana jinan dike, di kontrolên rê de bi gotinên “Ev fermanek e” jinên li qoltuxên pêş rûniştîne peya dike, wan neçar dihêle li yên paş rûnin.

[https://jinhaagency.com/ku/rojane/talibane-qoltuxen-pesin-en-wesayidan-ji-bo-jinan-qedexe-kir-41947](https://jinhaagency.com/ku/rojane/talibane-qoltuxen-pesin-en-wesayidan-ji-bo-jinan-qedexe-kir-41947)

Çavkanî:JINAH




# [Jin bi projeya 'Çavdêriyê' biryarên darazê dinirxînin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-bi-projeya-Cavderiye-biryaren-daraze-dinirxinin-41948)

Projeya Çavdêriya Jinê ya Tûnis û Mexrîbê biryarên darazê yên li dijî tundiya li ser jinan bi awayekî elektronîkî dişopîne. Jinan diyar kirin ku çavdêrî dê wekî navenda daneyê bixebite

[https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-bi-projeya-Cavderiye-biryaren-daraze-dinirxinin-41948](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-bi-projeya-Cavderiye-biryaren-daraze-dinirxinin-41948)

Çavkanî:JINHA



# [Xwepêşandanên li Sûweydayê didome: Em gav paş de navêjin]

Xwepêşandanên Sûweyda ev sê mehe berdewam dike, jinên ku bejdarî xwepêşandanê bûne diyarkirin ku heta daxwazên wan neyên bicihanîn wê xwepêşandanên wan dom bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xwepesandanen-li-suweydaye-didome-em-gav-pas-de-navejin-/41949

Çavkanî:JINHA




# [Doza TJA'yê dewam dike]

ENQERE - Parêzerên di doza TJA'yê de parastin kirin beyanên şahidê vekirî Samî Baran û şahidê veşarî Ulaş vala derdixin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221073

Çavkanî:JINNEWS



## Li Bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê di mehekê de 28 jin hatin qeti

Li Bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê di meha Cotmehê de 28 jin hatine qetilkirin, 13 jin û 3 zarok bi guman jiyana xwe ji dest dane.

https://rojnews.news/ku/?p=286936

Çavkanî:ROJNEWS



## Rojnameger Hêvîdar Xalid: Li dijî polîtikayên şer divê jin xwe rêxistin bikin

Rojnemevan Hêvîdar Xalid destnîşan kir ku cîhan alozî û pevçûnên ku hêzên serdest avakir dijî. Çareseriya vê pêvajoyê ango şerê cîhanê yê 3’emîn ku di asta yekê de jin dibin mexdûr, Netewa Demokratîk e.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnameger-hevidar-xalid-li-diji-politikayen-ser-dive-jin-xwe-rexistin-bikin-41889

Çavkanî:JINHA



## Li Reqayê pêşbirka hunerî ya jinên ciwan

Nivîsgeha Jinan a Reqayê ya girêdayî Komîteya Ciwan û Werzîşê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Reqayê pêşbirkeke hunerî li dar xist. Di pêşbirkê de 8 jinên ciwan beşdar bûne.

https://hawarnews.com/kr/li-reqaye-pesbirka-huneri-ya-jinen-ciwan

Çavkanî:ANHA



## Di nav rêgirî û êrişan de bi ava hinaran debara xwe dike

Sînam Hebeş a Efrînê ku piştî dagirkeriya dewleta Tirk neçar ma koçî Şehbayê bike û niha di bin rêgiriya hikumeta Şamê de dijî bi malbata xwe re bi çêkirina ava hinaran debara xwe dike

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/di-nav-regiri-u-erisan-de-bi-ava-hinaran-debara-xwe-dike-41914

Çavkanî:JINHA



## Bi xebatên saziyên xizmetê bersiva êrişên dewleta Tirk tê dayîn

Saziyên xizmetguzariyê yên ku li dijî kêmbûna nan, av, sotemenî û ceyranê ya sivîlên di xeta agir de çalakî li dar xistin, tevî hemû êrîşên dewleta Tirk ji bo pêdiviyên xwe bigihînin gel, hewldaneke mezin didin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/bi-xebaten-saziyen-xizmete-bersiva-erisen-dewleta-tirk-te-dayin-41915

Çavkanî:JINHA



## Mamosteyên teqawîdbûyî nikarin mehaneya xwe bigrin

Li Idliba dagirkirî dewleta Tirk û çeteyên HTŞ'ê yên girêdayî wî mûçe û tezmînata mamosteyên ji 60 salî mezintir nadin. Mamosteyên jin ên teqawidbûyî daxwaza mûçeyên xwe dikin û diyar kirin ku ew dixwazin jiyana bi rûmet bijîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mamosteyen-teqawidbuyi-nikarin-mehaneya-xwe-bigrin-41940

Çavkanî:JINHA



Kongra Star
11.11.2023